# Ziyareta gurê biçûk

2|3



Gurê biçûk roja yekşemê bi dizî dikeve dibistana lîstikan,
ku kesek tê de tune. Gur erebeyên ku zaro pê dilîzin bêhn dike.
Bilye yên sor û hêşin û zer bêhn dike. Peykere bizineka
ji daran bêhn dike û bi xwe ra dibêje: “Ezê li vir bimînim!”

4|5



Die wê demê de bircekê dibîne. Birc ji daran çêkiri ye. Gur radibe
pê ve hildikişe – lê feqet gummm! Birc dişihite û gurê biçûk
dikeve erdê. Li vêdere xwe dike soleka şimikî vedişêre û dikeve xewê.

6|7



Roja duşemê sibê gurê piçûk bi şematê zaroyan ji xew radibe
û xwe bi lêz dike bin dolabeke. Solên şimikî yên zarokan
û solên spor yên birêz Sonja di ber çavên wî re derbas dibin.

8|9




Gurê biçuk kenên zaroyan dibihîse. Bi dizî ji bin dolabê li wana dinihêre.
Zaroyan li aletên musikî dixin, xwe çedikin û govend dikin û saz li ser
bizineke dibêjin.

10|11



Di wextê êvarê de hemu zaro belav dibin. Gurê piçûk hildikişe ser masê.
Kaxiz û firçê tîne ku wênan çêbike. Wê demê de bi dengekî nizm sazê
bizinê ku pir li kêfa wî dihat bi xwe ra dibêje.

12|13



Roja sêşemê bandeke zeliqandinê hol dibe bin dolabê û cem gurê
biçûk disekine. Gur band hema hol dike şunda dişîne. Ew dibîne
ku zaro kartonan li derdorê du masan digerînen ku pê dikin gemî.




© Lehrmittelverlag des Kantons Zürich, 2005, www.lehrmittelverlag.com/dienstleistungen/lehrmittelservice
«Besuch vom kleinen Wolf» von Silvia Hüsler, Kurmancî (Nordkurdisch), Übersetzung: Mahmut Arslan

14 | 15



Di vê şevê de gur radibe û diceribîne ku puzzle bi hevda bike.
Feqet, ew tiştê ku bêhneka xweş jê tê eceb çi ye?

16 | 17



Roja çarşemê gurê piçûk gazincê birêz Sonja dibihîse. Ew dibêje:
"Kê ji pastê ji boy cejna jidayîkbûna Anna xwariye?" Feqet dû re ji nû ve pastê bi gulên ji şêkir dixemilîne. Zaroyan li ser bêraqên kaxizê wênan çêdikin û daxwazên pirozkirinê dinivîsin. Bêraqan di pastê de diçikînin û ji bo Anna sazeke li ser roja jidayikbûna xwe distirên.

18 | 19



Gurê piçûk ji xwe re dibêje: "Wê şevê ezê jî tiştekî binivîsim!",
û li pênivisên rengî digere. Ew heta sibê dinivîse û wêne çêdike.
Roja pêncşemê ye. Zaro bi şematê dikevine dibistanê lîstikan.

20 | 21



Gurê piçûk xwe ji bin de çedike jor, li hindirî berkêşkeke (çekmece) vekirî dikeve. Di vê demê de birêz Sonja jî tê. Ew bi xwe re dibêje:
"Gerek e ku zarokan wan tiştan bidine hev!" û berkêşkê digire.
"Aman, aman!" Nigê gur kete ji nav berkêşk û masê.

22 | 23



Şansê wî heye, ku ew dikare pencê nigê xwe ji wê re derdixe û posê xwe ji berkêşkê derxe derva. Ew dibîne ku jineka cazî piçuk sifre ji xwarinê re amade dike. Sihirbazek gezêran hûr dike. Du zaro bi hev re şer dikin, her du jî maskê gurekî dixwazin. Gurê piçûk li wan dinihêre û bi wana dikene.



© Lehrmittelverlag des Kantons Zürich, 2005, www.lehrmittelverlag.com/dienstleistungen/lehrmittelservice
«Besuch vom kleinen Wolf» von Silvia Hüsler, Kurmancî (Nordkurdisch), Übersetzung: Mahmut Arslan

24 | 25



Di vê şevê de gurê piçûk rayê trênê darê bi hevda dike û trênê dide ajotin.
Ew bircekî, istasiyona trênê û axurekî ji bizinê re çêdike.

26 | 27




Roja paşînê, dema ku birêz Sonja çiroka kecika kumsor dibêje, gurê piçûk guhên xwe tit dike. Ew ji çirokan pir hez dike, lê ew naxwaze ku ji heqê necirvên û tifinga wî tiştekî bibihîse. Ew bi her du pencên xwe guhên xwe digire.



28 | 29

Vê şevê gurê piçûk hemu pirtûkên bi wêne ji refan tîne û yeko yeko li wan dûr û dirêj dinihêre.

30 | 31



Roja paşînê gurê piçûk eceb dimîne. “Çirra hîro her der ewqas bêdeng dimîne?” Wê çaxê sipirgeke mezin tê bin dolabê û gurê piçûk derdixe derve. Jinika ku hindir paqij dike, dibêje: “çi gurekî baş e! Ezê wî di erebê bûkan re kim!”

32 | 33



Roja yekşemê kesek gurê piçûk eciz nake. Ew li ser ocaxekî piçûk yê zaroyan şorbeke bi lezzet çêdike. Tê de herfên alfabê hene …

34 | 35



… û ew hemu bûkan û heywanên ji paçan û bi taybetî bizina ji daran ya ku ew jê hez dike, dawetê şivê cejnê dike.



© Lehrmittelverlag des Kantons Zürich, 2005, www.lehrmittelverlag.com/dienstleistungen/lehrmittelservice
«Besuch vom kleinen Wolf» von Silvia Hüsler, Kurmancî (Nordkurdisch), Übersetzung: Mahmut Arslan